## Xwendekar jî daketin qadan



Niha jî li Fransayê, bi hezaran xwendekarên lîseyê li hemberî pergala perwerdeyê ya 'Parcoûrsûpê', daketin qadan. Di vê çarçoveyê de duh bi dehhezaran xwendekarên lîseyê li dehan bajaran ders boykot kirin û neçûn dibistanan. Polîsan êrîşî çalakiya xwendekaran kir û zêdetirî 750 xwendekar binçav kirin... R.4




## Pêşbirka xwendina kurdî

Înîsiyatîfa Edebiyat û Zanistiyê ya Ronakê, Pêşbirka Xwendina Edebiyata Kurdî li dar dixe. Serlêdanên pêşbirkê di 6'ê kanûnê de dest pê kirin û dê heta 16'ê kanûnê dewam bikin. Pêşbirk dê di 20'ê kanûnê de dest pê bike û heta 10'ê sibata 2019'an dewam bike. Armanca vê pêşbirkê geşkirina xebatên kurdî ye.


# e-rojname

8 Kanûn - Şemî 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 198


## Şerê Cîhanê yê Sêyemîn...



Şerê Cîhanê yê Sêyemîn hîn bi dawî nebû ye. Xuyaye ku dê ev şer, sînorên heyî derbas bike û li erdnîgariyeke pir berfirehtir belav bibe. Kurdistan navenda vî şerî ye û dê vê rola xwe jî berdewam bike. Tevî rûdana van bûyeran, dê her tim hewl bidin ku komploya navneteweyî jî nûjen bikin. Hewldana ku dixwazin erdnîgariya Îranê bi lez û bez bixin nava sînorên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn...*Nivîsa Cûmalî Dogan* / R.3

# DAXWAZA BI MILYONAN E

**Ji bakurê Kurdistanê heta bajarên Tirkiyeyê, ji welatên Ewropayê heta Kanadayê û li Hewlêr û Rojava ji bo rakirina tecrîdê grevên birçîbûnê tên lidarxistin. Daxwaza bi milyonan ew e ku tecrîda li ser Ocalan were rakirin**



### MEHEK DERBAS BÛ

*HEVSEROKA* KCD'ê û parlamenter Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan 31 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Berxwedana greva birçîbûnê pêl bi pêl mezin dibe û her roj li deverekê komek dest bi greva birçîbûnê dike.

### PÊVAJOYA KRÎTÎK

*PARÊZERÊN* Leyla Guven têkildarî greva birçîbûnê li Amedê daxuyanî da çapemeniyê. Parêzeran bi bîr xist ku greva birçîbûnê mehek li pişt xwe hiştiye, ketiye demeke krîtîk û beriya ku rewşeke travmatîk çêbibe divê gav bên avêtin. Parêzeran got ku rêveberiya girtîgehê vîtamîna B1 nade Leyla Guven.

### ŞIKANDINA TECRÎDÊ

*PARÊZERA* Ocalan parlamenter Ebru Gunay têkildarî tecrîdê ji rojnameya me re axivî û anî ziman ku daxwazên Leyla Guven daxwazên herî mirovî ne û wiha got: "Şikandina tecrîdê tê wateya gav bi gav şikandin û helandina faşîzmê. Lê ji niha û şûnde pêwîst e çalakî bên xurtkirin."... RÛPEL - 3/6

### Li her derê meş û grev

Li binarê Qendîlê ji bo piştgiriya berxwedana grevê meş hat lidarxistin. Li Çilaxayê komek dest bi grevê kir. Li gelek bajarên Ewropayê li dijî tecrîdê grevên birçîbûnê dest pê kir... RÛPEL - 3


### 'Em ê tecrîdê bixin rojeva her kesî'

RÛPEL - 3



## Cenazeyan tewrê hafrîyatî eştî

Kênaya Fahrîye Çukure, Rozerîn Çukure (17) 8ê çeleyê 2016î de nizdîyê Mektebê Seretayî yê Suleyman Nazîfî de ameye qetilkerdene. Fahrîye Çukure wina va: "Cenazeyê merdiman tewrê hafrîyatî eştî Çemê Dîcle."... RÛPEL - 5



## Cizîr xoverdayîş û ruhê Newroze yo

Cizîro ke xoverdayîşê Newroza 1992î ke vîrê heme merdiman de ca girewt, bi qedexeyê 14ê kanûna 2015î ke 79 rojan dewam kerdbî reyna dejê merdiman newe bî. Xoverdayîş ra nata 3 serrî derbaz bî... RÛPEL - 5



## Amadekariyên hilbijartinê dewam dikin

HDP, dê li bajarên kurdan bi pêşhilbijartina bernamzetan namzetan diyar bike. HDP, li bajarên Tirkiyeyê jî xebatên ji bo kesên xwedî îdia ku ji aliyê her kesî ve bên pejirandin dikin. Li gorî Kulîsan li Stenbolê Celal Dogan, li Îzmîrê Sirri Sakik, li Edeneyê Fatma Kurtulan û li Mêrsînê jî navê Ayhan Bilgen tên axaftin. HDP'ê destnîşan kir ku ji bo serlêdana namzetên ji bo hilbijartina herêmî ya HDP'ê 5 roj mane.



## 27 serran xo dima verda

Emserr serrgêra 27. ya Merkezê Kultur û Mezopotamya (NÇM) ya. Bi wesîleya serrgêra 27. ya awanbîyayîşê NÇMyî Veysel Altay, Cîhat Ekîncî û Omer Şahînî derheqê tarîx û karê ke heta nika ameyî kerdiş de qisey kerdî... RÛPEL - 5

## Li Şengalê Cejna Rojiyên Êzî ya Feqîran

Li gorî Hesaba Şengalê, Rojiyên Êzî yên Feqîran roja sêşemê dest pê kiribûn û pêr bi dawî bûn. Di çarçoveya cejnê de gelê herêma Şengalê û gundewarên wê, destpêkê çûn goristanan. Welatiyan piştre jî cejna hev pîroz kirin û serdana hev kirin. Di baweriya Êzdayetiyê de hefteya yekem û duyem a kanûnê, rojên herî kurt ên salê ne, lewma di van hefteyan de 3 rojan rojî tê girtin.



## Zextên li ser Tevgera Azadî şermezar kirin

YNK'ê di dawiya meha mijdarê de piştî peymanên veşarî yên bi Tirkiyeyê re navendên Tevgera Azadî û RJAK'ê yên li başûrê Kurdistanê girtin û hemû xebatên wan da rawestandin. KKP û PÎA'yê bertek nîşanî helwesta YNK'ê dan... R.3



## Li Seyidsadiqê sê kurtefîlmên li ser tundiyê hatin pêşandan

**SILÊMANÎ -** Li navçeya Seyidsadiq a Silêmaniyê ji bo di warê encamên xerab ên tundiya li hemberî jinan de ciwan werin şiyarkirin, sê kurtefîlm hatin pêşandan. Kurtefîlma yekem 'Pereyê Spî' bû ku Viyan Maiy derhêneriya wê kiri. Mêjara wê heskirina hevseran bû. Kurtefîlm nîşan dide ku hezkirin hebe rewşa xerab a aboriyê nabe sedema tundiyê. Kurtefîlma duyemîn a bi navê 'Sê' bû ku Herdî Selam derhêneriya wê kiriye. Kurtefîlma sêyemîn jî 'Soma' bû ku Merîwan Îbrahîm derhêneriya wê kiriye. Ev kurtefîlm jî qala encamên tundiya li hemberî jinan dike. Lê di fîlm de tê nîşan dan ku îradeya bi hêz a jinan dikare rê li pêşiya tundiyê bigire.

# 'Dayikên şoreşger dê xeta azadiyê bidomînin'

Dayika şoreşger Minawir Cefer der barê naskirina xwe ya tevgera azadiyê û hevdîtina xwe ya bi Ocalan re axivî û wiha got: "Hemû dayikên ku ji bo azadiya Rêber Apo li ber xwe didin divê xwedî li fikrên wî derkevin. Dayikên şoreşger dê xeta tekoşîna azadiyê bidomînin."



Dayika şoreşger a bi navê Minawer Cefer a 90 salî ku di rêya têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê de 2 zarokên wê şehîd bûne, behsa hevdîtina xwe ya bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kir.

Dayikê di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku ew bi saya zarokên xwe doza têkoşîna ji bo azadiyê nas kiriye û wiha got: "Zarokên min dema ku tev li tevgera têkoşîna azadiyê bûn, gotin dema em şehîd bikevin negirî bi me serbilind be. Wexta zarokên min şehîd ketin, min soz dabû ku ez ji rêya heqîqetê venagerim. Dema rêjîma Baasê bihîst ku em malbateke şoreşger in her car ez dibirim zindanê ji bo ku ez ji vê xetê vegerim lê her vîna min ji îşkenceya dewletê mezintir bû. Bi hêza jina azad min li ber xwe da. Ji ber ku jina azad dildara axa xwe ye û domdara tekoşîna azadiyê ye. Ez şopdara doza zarokên xwe ya azadiyê û aştiyê me. Daxwaza min û ya zarokên min ew e ku Serok Apo azad bibe."


**'Ez gelek bi kelecan bûm'**

Dayika Minawir di axaftina xwe de qala hevdîtina xwe ya bi Ocalan re kir û wiha domand: "Dema cara dawiyê ez ji zindanê derketim serokatî ez vexwendim hevdîtinên li Şamê. Ez gelek kêfxweş û bi kelecan bûm. Bi rastî jî em mirovên bi şans bûn ku me rêberekî ewqasî bi hêz dît."

**Bi zarokên xwe serbilind e**

Her wiha dayikê da zanîn ku ew bi têkoşîna zarokên xwe serbilind e û diyar kir ku divê hemû dayikên ji bo azadiya Ocalan li ber xwe didin xwedî li fikrên wî derkevin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Dayikên şoreşger dê bi îradeya xwe xeta tekoşîna azadiyê bidomînin. Ji bo dîrok aştiyê bi tîpên zêrîn binivîse û têkoşîna heyî ji nifşên nû re bibe sûd divê xwedî li hewldana ji bo azadiya Rêber Apo bê derketin." *DÊRIK*

## Dê civak bi têkoşîna jinan rizgar bibe



Hevberdevka HDK'ê û parlamentera HDP'ê ya Mûşê Gulîstan Kiliç Koçyîgît bal kişand ser girîngiya nûneriya jinan a di qada siyasetê de û der barê mijarê de nirxandin kir.

Koçyîgît destnîşan kir ku nîvê civakê jin in, ev nûneriya jinan gelek girîng e û wiha got: "Jinan jî di nav xwe de têkoşînek mezin ava kiriye. Yên barê herî giran dane ser milên xwe jin in. Heta jin di siyasetê hebin dê pergala serdest a mêr jî bê hilweşandin, pergala wekhev a azadiya jinê bê avakirin. Girîngiya nûneriya jinê me di partiya xwe de dîtiye. Dema nû tevgera siyasî ya kurd hatiye destpêkirin em dîsa jinan dibînin. Lê ev xurtbûn piştre pêk hat. Roj bi roj jin xurt bûn. Her ku jin xurt bûn pêngava azadiyê jî xurt bû."

**Dixwazin civakek nû ava bikin**

Koçyîgît anî ziman ku bi tifaqa AKP-MHP'ê hewl tê dayîn ku civakeke nû ya bê jin bê avakirin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Tehemula tifaqa AKP-MHP'ê ji azadiyan re bi taybetî ji azadiya jinan re tune ye. Dema mirov vê dibînin girîngiya ku HDP dide jinan gelek baş tê fêhmkirin. Di navbera HDP û tifaqa AKP-MHP'ê de cudahiyek mezin heye. AKP-MHP bi destê darazê ewil berê xwe didin jinan û ev jî ne tesaduf e. Sedema vê jî tê zanîn ku wê civak ji aliyê jinan ve azad bibe. Divê jin li dijî polîtîkayên zextê, rêxistinbûna xwe di qada siyasetê de xurtir bikin. Di vî alî de bi pergala hevserokatiyê divê nûneriya jinan a xurtir derxin holê." *AMED*

## Mezinkirina çalakiyê peywira jinan e

Parlementera HDP'ê ya Colemêrgê û hevseroka KCD'ê Leyla Guven bi armanca şikandina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 8'ê mijdarê de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kir. Çalakiya ku Guven daye destpêkirin di roja 31'emîn de didome. Ji bo piştgirîdayîna daxwazên Guven girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê jî di 27'ê mijdarê de dest bi çalakiya greva biçîbûnê kir û parlamenterên HDP'ê jî li gelek bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê dest bi çalakiya 3 rojan kir. Her wiha li rojava û başûrê Kurdistanê û seranserê bajarên Ewropayê jî kurdistanî bi heman armancê dest bi çalakiyên greva birçîbûnê kir.

Der barê çalakiya Guven de jinên Mêrdînê axivîn û diyar kirin ku heta dawiyê dê li pişta çalakî û berxwedana Guven bin.

**Çalakiya Guven pîroz e**

Dayika bi navê Cemîle Îldenîz ku çalakiya Guven silav kir, anî ziman ku Guven ji ber tecrîda li ser Ocalan dest bi greva birçîbûnê kiriye û wiha got: "Di demeke nêz de em dixwazin tecrîda li ser Ocalan bê rakirin. Çawa ku serokê hemû welatan heye, Serokê me jî Abdullah Ocalan e. Çalakiya ku Leyla daye destpêkirin gelek pîroz e. Divê em piştgiriyek xurt bidin Leyla Guven. Îro Leyla ronahiyek pêxist û divê em gelê kurd bi taybetî jin rabin ser pêyan û li dijî tecrîdê li ber xwe bidin. Roj roja têkoşînê ye. Armanca Leyla û girtiyên dest bi greva birçîbûnê kirine ji bo hebûn û tunebûna gelê kurd e. Ev peywir ne bi tenê peywira Leyla ye. Ev peywir ya me hemû jinan e."





**Divê deng bê bilindkirin**

Dayika Aştiyê ya Mêrdînê Halîme Işik jî da zanîn pêwîst e hemû dayik, jin ji bo Leyla Guven û tecrîda li ser Ocalan bê rakirin berê xwe bidin kolanan û çalakiyan li dar bixin û wiha got: "Îro roj roja berxwedanê ye. Divê em dengê xwe bilind bikin. Çalakiya Leyla Guven daye destpêkirin bersiva li hemberî pergal û polîtîkayên xerab e. Yên ku îro bikaribin têcrîdê bişikîn jin in." *MÊRDÎN*









## Jin li Çelê tehîna kunciyan çêdikin

Bi hatina zivistanê re li gundê Biyadirê yê girêdayî navçeya Çelê ya Colemêrgê jinan li aşê dîrokî dest bi çêkirina tehîna kunciyan kir. Li heremê bi salan e gundî di meha gulanê de tovên kunciyan diavêjin axê û piştî ku kuncî şîn dibin diçinin û li ber tavê hişk dikin û dikin torbeyan. Tehîna ku bi sedan sal in bi dest û keda jinan tê hilbirandin, li herêmê rastî eleqeyeke mezin tê.

Jinên ku li aşê dîrokî piştî hêrandina kunciyan bi hewldan û kedeke mezin tehînê hildibirînin diyar kirin ku ew bi salan e hilbirîna tehînê dikin û gotin ku ew ê tu carî dev ji çêkirina tehînê bernedin. Her wiha jinan destnîşan kir ku dê destûr nedin ev kevneşopî û keda bi salan winda bibe. *COLEMÊRG*

## Bi xebatê re hêz û baweriya wan zêdetir dibe

Tevî zehmetiyên zivistanê re jî jinên li Qamişloyê yên ku debara xwe bi çandiniyê dikin diyar dikin ku keda destan pîroz e.

Jina bi navê Menal Elî anî ziman ku 3 sal in ew û keça xwe di nav baxçeyan de dixebitin û wiha got: "Em pîvaz, pûng, bexdenûs diçînin û piştre didin hev. Em li vir bi rengekî hevpar dixebitin û alîkariya hevdu dikin. Ya ku hêzê dide me xebat û xweza ye. Em dixwazin hemû jin bixebitin û hêz û baweriya xwe zêde bikin."

Her wiha karkera bi navê Hala Elî jî li ser karê xwe yê rojane axivî û ev tişt anî ziman: "Ez û hevalên xwe bi hev re dixebitin. Dema em bi keda destên xwe debara xwe dikin bawerî û hêza me zêdetir dibe. Ji bo em hêviya xwe ya jiyanê winda nekin em dixebitin. Em ji xebat û xwezayê gelek hez dikin." *QAMIŞLO*



## Jinên Tebqayê amadekariya vekirina 2 koperatîfan dikin



Ji bo xurtkirina jiyana civakî ya hevpar û pêşxistina aboriya civakî, bi taybetî aboriya jinan, Mala Kooperatîfan a Komîteya Aborî ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Herêma Tebqayê amadekariyên vekirina 2 kooperatîfan dike.

Hevseroka Mala Kooperatîfan Necma Hilal armanca vekirina projeyê diyar kir û anî ziman ku armanca wan ew e ku derfetên kar ji jinan re peyda bikin û aboriya xweser bi pêş bixin.

Hilal da zanîn ku navê kooperatîfê Seyidat El Furat (Jinên Firatê) e, ev proje dê ji bo çêkirina cilên rîs, pêvekirina bişkokan, xişir û pûl be û ya herî girîng jî serastkirina tiştên kevn wekî caw û pakêtên kartonan e da ku careke din bên bikaranîn.

Hilal destnîşan kir ku jin bi dildarî ji bo amadekirna her du projeyan xebitîne û wiha got: "Roj bi roj jin îsbat dikin ku ew dikarin di hemû waran de bixebitin û xwe di civakê de çalak bikin."

Hêjayî bibîrxistinê ye ku Mala Kooperatîfan beriya bi çend mehan di destpêka avakirinê de projeya zeviyên masiyan çalak kiribû. *TEBQA*

www.arsivakurd.org

# Şerê Cîhanê yê Sêyemîn û Kompoloya Navneteweyî

CÛMALÎ DOGAN

Rastiya ku Şerê Cîhanê yê Sêyemîn û kompoloya navneteweyî di nav hev de tê jiyîn tê zanîn. A rast ne pêkan ku mirov her du bûyeran ji hevdu cuda bifikire. Wexta ku li pêşketina Şerê Cîhanê yê Sêyemîn û dirûvgirtina îro ya kompoloya navneteweyî bê nihêrin ev rastî bi awayekî zelal xwe nîşan dide.

Gelek caran li ser kompoloya li hemberî Rêber Apo ya di 9'ê Cotmeha 1998'an de pêk hat ku çima jê re dibêjin kompoloya navneteweyî hat sekinîn. Her çiqas hin kes û derdor hîn jî di fêhmkirina vê rastiyê de zehemtî bikişînin jî, aktorên ku tê de cih girtin û hatina asta kompoloyê didin xuyakirin ku pênasekirina vê çiqas rast e.

Beriya ku kompoloya 9'ê Cotmeha 1998'an bikeve meriyetê, di navbera aktorên bingehîn de guftûgo hatibûn kirin û ev aktor li hev kiribûn. Hevpeymana 17'yê Îlona 1998'an a di navbera DYA û hêzên başûrê Kurdistanê PDK-YNK'ê de ya li Washingtonê yek ji van hevpeymana bû. Dikare bê gotin ku bi vê hevpeymanê xwestin kompoloya navneteweyî ji aliyê lingê kurd ve jî meşrû bikin û dest bi kompoloyê hat kirin. Beriya vê, hevdîtinên di navbera DYA û Îngilistanê de, bazariyên bi Yewnanistanê re gefên şer ên Komutaniya Hêzên Bejahiyê yê TC'ê Atîlla Ateş ên li hemberî Sûriyeyê û hwd. hemû ji bo pêkanîna kompoloyê bûn.

Lê belê ev pêngavên ji bo kompoloyê hatin avêtin û çêkirina hevpeymanan, ji Şerê Cîhanê yê Sêyemîn yê wê demê dihat jiyîn ku leza wê daketibû, cuda nînbûn. Berevajiyê vê yekê xwestin ew hedefên ku bi Şerê Cîhanê yê Sêyemîn pêk bînin astengiya herî mezin ji pêşiya xwe rabikin. Ji ber ku bi Şerê Kendavê yê Yekemîn ê di navbera DYA, hevkarên xwe û Iraqê de yê sala 1990-1991'î negihîştibûn hedefên xwe. Sedemên vê hebûn. Tevî ku Iraq-Seddam xwe ji Kuveytê vekişand jî, di mercên wê demê de DYA'ê têkbirina Seddam û bidestxistina Bexdadê ji bo berjewediyên xwe baş nedît. Ji ber ku gumana wan a ku dê Iraq jî bibe Afganistana duyemîn hebû.

DYA difikirî ku rejîma Seddam hilweşe dê gelek hêzên cuda yên di bin kontrola hin dewletên din de derên holê û ev metirsiyek bû hember berjewendiyê wê. Diviya DYA'ê di serî de li hemberî kurdan tedbîran werbigirta. DYA'yê beriya ku Iraq û Rojhilata Navîn ji nû ve saz bike mecbûr ma ku rola kurd/Kurdistanê li ber çavan bigire û berî ku rejîma Seddam birûxîne xwest bigihîje vê hedefa xwe. Kompoloya navneteweyî ya li hemberî Rêber Apo jî di nav vê rastiyê de cihê xwe girt.

Tu pirsgirêkên DYA'yê bi PDK an jî YNK'ê re nînin. DYA xwedî feraseteke ku mirov dikare bibêje hema hema di hemû mijaran de bi wan re li hev dike ye. Têkiliyên wan wisa xurtin ku dikarin vê yekê bikin. DYA bi polîtîkaya xwe ya li dijî kurdan re, dixwaze YNK û PDK'ê li cem xwe bigire û di pergala nû ya ku li Iraq û Rojhilata Navîn ava dike de, kurdan bixe rewşeke wisa ku li gorî berjewendiyên wê tevbigere. Ji bilî vê jî tu nêzikatiyên wê yên cuda nînin. Nêzikatiya wê ya li hemberî pirsgirêka kurd jî tenê bi vê nêrînê re ne sînordar e. Dixwaze kurdan bi temamî bike dûvika xwe û nehêle ku bi awayekî xweser tevbigerin. Ji bo ku van planên xwe pêk bîne jî dixwaze kurdên ku li pêşiya vê planê dibin asteng, ji holê rake. Ji ber vê jî Rêber Apo, PKK, şoreşger, azadîxwaz û kesayetên demokrat ên ku têkoşîna rizgariyê didin, wek asteng dibîne. Dixwaze van derdoran ji holê rake.

Ya esasî jî ew e ku DYA bi kompoloya navneteweyî re dixwaze xwe bigihîne van hedefan. Rûdanên piştî kompoloyê jî ev yek piştrast kiriye. Bi mudaxaleya leşkerî ya li Iraqê re rejîma Seddam Huseyîn têk birin. Lê nekarîn pêşî li parçebûna Iraqê bigirin. Tenê bi vê jî bi sînor nema, her çiqas bi kompoloya navneteweyî re Rêber Apo dîl girtî bin jî, negihîştin armancên xwe. Rêber Apo pêşî li kompoloyê girt û tevgera ku ji kompoloyê hesab dipirse da destpêkirin. Bi paradîgmaya nû re, li Kurdistan û temamiya cîhanê, di dîroka têkoşînê ya şoreşger û sosyalîstan de rê li ber pêvajoyeke nû vekir. Xet û têkoşîna ku rêbertiya wê dikir, li rojavayê Kurdistanê veguherî şoreş û modelekê. Ev şoreş û model jî di serî de Rojhilata Navîn, ji bo temamiya gelên cîhanê bû çavkaniya hêvî û hêzê. Li hemberî şerê emperyalîst, ev qewimîn jî weke tercîha gelê Kurdistanê derket holê. Bi vê re jî pêşî li kompoloya navneteweyî hate girtin û nehiştin ku bigihîjin hedefên xwe. PKK, sala 20'emîn a kompoloyê û sala 40'emîn a damezirandina xwe, bi rastiyeke wiha re pêşwazî kir. Di vê wateyê de em dikarin bibêjin ku komplo û hêzên ku di kompoloyê de cih girtin, têk birin. Lê ev rastî nayê wê wateyê ku hêzên komploger ji armancên xwe vegerîne. Tevî vê têkçûnê jî hêzên komploger ji bo ku bigihîjin armancên xwe, êrîşên xwe berdewam dikin. Di rojên ku PKK'ê amadekariyên 40'emîn salvegera damezirandinê xwe dikir, biryara hêzên komploger a der barê rêveberên PKK'ê de ku DYA'yê xwest bi vê biryarê re kompoloya navneteweyî nûjen bike, rêvekirina li ber êrîşên qirkirinê yên TC'ê û hewldanên ji bo anîne berhev a hêzên başûrê Kurdistanê û PKK'ê, vê rastiyê nîşan dide. Şerê Cîhanê yê Sêyemîn hîn bi dawî nebûye. Xuyaye ku dê ev şer, sînorên heyî derbas bike û li erdnîgariyeke pir berfirehtir belav bibe. Kurdistan navenda vî şerî ye û dê vê rola xwe jî berdewam bike. Tevî rûdana van bûyeran, dê her tim hewl bidin ku kompoloya navneteweyî jî nûjen bikin. Hewldana ku dixwazin erdnîgariya Îranê bi lez û bez bixin nav Şerê Cîhanê yê Sêyemîn, biryara aktora sereke ya kompoloya navneteweyî DYA'yê ya der barê rêveberên PKK'ê de û lîstikên ku li başûrê Kurdistanê tên lîstin, vê yekê nîşan didin.

# Bênavber dê çalakî û têkoşîn bidomin

Parlamenterê HDP'ê yê Amedê Selçuk Mizrakli bêdengiya hikûmetê ya li hemberî çalakiya greva birçîbûnê ya Leyla Guven şermezar kir û ev tişt vegot: "Bêdengiya hikûmetê dê qêrîna me xurttir bike. Dawiya dawî jî dê hikûmet neçar bimîne bersiv bide vê daxwazê."

Çalakiya greva birçîbûnê ya hevseroka KCD û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven a bi boneya şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin di roja 31'emîn de ye. Tevî ku çalakiya Guven berbelavî gelek bajar û heta meclisê bû jî ji bo bidawîkirina tecrîdê hêj gavek ji aliyê hikûmeta AKP'ê ve nehatiye avêtivin.

Yek ji parlamenterê HDP'ê ku ji bo piştgiriya Guven 3 rojan li Amedê ket çalakiya greva birçîbûnê parlamenterê Amedê Selçuk Mizrakli bal kişand ser çalakiya Guven û bêdengiya hikumetê ya li hemberî çalakiyê.

Mizrakli diyar kir ku çalakiya Guven da destpêkirin di bingeha xwe de îtiraza li dijî hemû qewimandinên li Tirkiyeyê ye û got ku ew jî ji bo beşdarî îtîraz û daxwaza Guven bibin beşdarî çalakiyan dibin.



**Bêdengî dê qêrîna me xurttir bike**

Di axaftina xwe de Mizrakli bal kişand ser bêdengiya çapemeniya tirk a li hemberî tecrîdkirina Ocalan û çalakiya Leyla Guven û wiha domand: "Hikûmet û medya bi hev re bêdengiya xwe diparêz in. Bêdengiya wan dê qêrîna me ya ji bo Leyla Guven hîn xurttir bike. Helbet dê hikûmet neçar bimîne bersivê bide vê qêrînê û daxwazê. Em ê di vê arîfeya hilbijartinê de tecrîdê bixin rojeva her derdorê. Ev daxwaza azadiya mifteya çareseriyê ye. Heta demokrasiyek rasteqîn neyê welêt, dê rojên reş dewam bikin. Lê heke em bi milyonan li dijî rejîmê derkevin dê rojên azad û ronî nêz bin."

Di berdewamê de Mizrakli da zanîn ku çalakiyên bi armanca piştgiriya Guven mafê wan ê demokratîk û rewa ye û ji bo bidawîkirina tecrîd û pêkanîna aştiyê dê bênavber çalakiyên xwe bidomînin û têbikoşin. *AMED*

## Rewşa krîtîk dest pê kir

Parêzerên Guven der barê rewşa tenduristiya miwekîla xwe de li avahiya Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Amedê civîna çapemeniyê li dar xist û agahî dan.

Parêzera Cemîle Turhalli Balsak di civînê de axivî û pêvajoya girtina Guven bi bîr xist û wiha got: "Birêz Leyla Guven di 7'ê mijdarê de diyar kir ku ew li dijî tecrîdê dest bi greva birçîbûnê dike. Îro çalakiya wê ket roja 31'yemîn û rewş ber bi xeteriyê ve diçe. Guven ji bîr dike û di warê axaftinê de jî pirsgirêkan dijî. Dîsa di sala 2012'an de jî dema ku li girtîgehê ketibû greva birçîbûnê ew rakiribûn nexweşxaneyê û di serê wê de tumor peyda bibû. Divê Guven derman bi kar bîne lê ji ber ku di grevê de ye bi kar nayne."

Turhalli anî ziman ku di greva birçîbûnê de vîtamîna B1 û vexwarin girîng in û wiha dewam kir: "Der barê rewşê de me bi rêveberiya girtîgehê re hevdîtin kir. Rêveberiyê diyar kir ku vîtamîna B1 ji derveyê welat tê û nikarin bînin. Nedayîna vê vîtamînê binpêkirina mafê tenduristiyê ye. Divê bi lezgînî çareserî bê dîtin."

Her wiha parêzer Serdar Çelebî jî destnîşan kir ku ew jî wek parêzerên Guven daxwaza wê di cih de dibînin û got ku divê daxwaza Guven bê qebûlkirin. *AMED*

## Ciwan li dijî tecrîdê dimeşin

Li herêma Dêrikê ya girêdayî kantona Qamişloyê Yekitiya Jinên Ciwan bi armanca şermezarkirina êrîşên dewleta tirk a dagirker û tecrîda li ser Ocalan bi dirûşma 'Ji bo bidawîkirna dagirkeriyê û rizgarkirina Rêber Ocalan serî hildin' ji gundê Xana Serê yê girêdayî Dêrikê dest bi meşê kir. Tê payîn ku dê meşa 2 rojan bidome.

Ji aliyê din ve bi pêşengiya Kongreya Star û PYD'ê piştî navenda Qamişloyê li navçeya Çilaxa ya girêdayî kantona Qamişloyê konê çalakiya greva birçîbûnê hat vedan. Di çalakiyê de hat gotin ku divê her kes ji bo rakirina tecrîdê çalakiya Leyla Guven ji xwe re mînak bigire û li gorî vê yekê tev li çalakiyan bibe. Her wiha tê payîn ku dê greva birçîbûnê 2 rojan berdewam bike û piştî Çilaxayê dê ciheke din konê greva birçîbûnê were vedan. *QAMIŞLO*



## Welatiyên Qendîlê piştgirî dan grevên birçîbûnê

Welatiyên Binarê Qendîlê li gundê Kuzîne yê herêma Marado ji bo piştgiriya grevên birçîbûnê yên ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Ocalan û çalakiya greva birçûnê ya Leyla Guven meşiyan. Piştî meşê li ser armanca çalakiyê daxuyaniyek hat dayîn.

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku daxwaza Guven daxwaza milyonan e û wiha hat gotin: "Em li vir piştgiriya Leyla Guven û hemû girtiyan dikin. Em piştgiya hemû çalakgerên greva birçîbûnê yên li Bakur, Başur û Tirkiyeyê dikin. Daxwazê ji raya giştî ya cîhanê û rêxistinên mafê mirovan dikin ku li hemberî hovîtiya dewleta tirk bibin xwedî helwest." *QENDÎL*



## Li gelek welatan çalakiyên li dijî tecrîdê

Çalakiyên ji bo rakirina tecrîda giran a li ser Ocalan û piştgiriya Leyla Guven didomin. Kurdistanî û dostên wan ên li bajarên Ewropayê jî ji bo şikandina tecrîdê û piştgiriya Guven dest bi greva birçîbûnê kirin.

Di çarçoveya van çalakiyan de kurdistaniyan li paytexta Fransa Parîsê, li paytexta Swîsre Bernê, li paytexta Swêd Stockholmê, li bajarên Darmstadt û Frankfûrtê yên Almanyayê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin.

Her wiha çalakiya greva birçîbûna ya ku li bajarê Torontoyê ya Kanadayê di 3'yê kanûnê de dest pê kiribû jî ket roja 6'emîn. *BRUKSEL*

## PÎA û KKP'ê bertek nîşanî biryara YNK'ê dan

NAVENDA NÛÇEYAN

YNK'ê di dawiya meha mijdarê de piştî peymanên veşarî yên bi Tirkiyeyê re navendên Tevgera Azadî û RJAK'ê yên li başûrê Kurdistanê girt û hemû xebatên wan da rawestandin. Serokê giştî yê Partiya Komunîst a Kurdistanê (KKP) Sînan Çîftyurek û Cigirê Serokê Partiya Mirov û Azadiyê (PÎA) Ahmet Kaya têkildarî vê biryara YNK axivîn û bertek nîşanî helwesta YNK'ê da.

Cîgirê serokê PÎA'yê Ahmet Kaya di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku girtina navendên Tevgera Azadî û RJAK'ê wek partî wan xemgîn dike û wiha got: "Ji ber ku biryara girtinê bi fermana Tirkiyeyê pêk hatiye em xemgîn in. Li gel ku nêzikbûna Tirkiyeyê ya li hemberî referandûma başûrê Kurdistanê bi awayekî zelal li holê ye cihê şermê ye ku ji bo başbûna têkiliyên bi Tirkiyeyê re biryarek bi vî rengî bê dayîn."

Kaya di berdewamê de anî ziman ku erêkirina daxwazên Tirkiyeyê ku li hemberî destkeftiyên kurdan ên li her dera cîhanê ye, nikare bi şertên polîtîk bê qebûlkirin û wiha pê de çû: "Rêveberiya başûrê Kurdistanê ji bo parastina deskeftiyên xwe pêwîst e ku bi hêzên kurd ên siyasî re têkiliyên xwe xurt bike. Biryara li dijî Tevgera Azadî ne rast e û em hêvî dikin ku YNK paşde gav bavêje û biryara xwe betal bike û serî li diyalogê bide."

**Divê biryara şaş ji holê rabe**

Serokê KKP'ê Sînan Çîftyurek di destpêka axaftina xwe de destnîşan kir ku ew wek partî biryara YNK'ê ya der barê girtina navendên Tevgera Azadî û RJAK'ê şaş dibînin û wiha got: "Em hêvî dikin ku di demek e nêz de dê vê biryara xwe şaş ji holê rakin."

Çîftyurek di berdewamê de qala krîzên ku di navbera YNK'ê û Tirkiyeyê de hene jî kir û got ku sedem çi dibe bila bibe diviya YNK'ê biryarên wiha şaş neda.



## 1.35 milyon kes ji ber qezayên trafîkê mirin

**BRUKSEL** - Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê ragihand, di nava salekê de 1.35 milyon kes ji ber qezayên trafîkê mirine. Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê rapora xwe ya global a li ser ewlekariya rê aşkera kir û diyar kir ku qezayên trafîkê êdî sedema bingehîn a mirina zarok û ciwanên di navbera 5-29 salî de ye. Rêxistinê ragihand ku hejmara mirovên ji ber qezayên trafîkê zêde dibe û di rapora xwe ya sala 2018'an de eşkera kir ku 1.35 milyon kes di rê de mirine. Di raporeke din de ku sala 2009'an hatibû aşkerakirin jî hatibû gotin ku 1.2 milyon kes bûne qurbanê qezayên trafîkê.

# Li Fransayê xwendekaran jî serî hil da

Li Fransayê piştî çalakiya Êlek Zeran, niha jî bi dehhezaran xwendekarên lîseyê ji bo protestokirina pergala perwerdeyê ya 'Parcoûrsûp'ê daketin qadan. Di pevçûnên ji duh heta niha de zêdetirî 750 xwendekar hatin binçavkirin lê tevî vê jî her ku diçe çalakiya xwendekaran mezin dibe

Çalakiyên gelê Fransayê yên li dijî pergala bêdad û newekhev berdewam in. Li hemberî bihabûna sotemeniyê, di 17'ê mijdarê de bi tevlêbûna gelek derdorên cuda bi dehhezaran welatiyên Fransayê daketin qadan. Çalakiya ku weke 'Çalakiya Êlek Zeran' tê pênasekirin, roj bi roj belav bû û bû sedem ku hikûmeta Macron zema ku dihat payîn dê li sotemeniyê bike, betal bike. Lê tevî vê yekê jî çalakvan bi israr in û banga mezinkirina çalakiyan kir.

Niha jî li Fransayê, bi hezaran xwendekarên lîseyê li hemberî pergala perwerdeyê ya 'Parcoûrsûpê', daketin qadan. Di vê çarçoveyê de duh bi dehhezaran xwendekarên lîseyê li dehan bajaran ders boykot kirin û neçûn dibistanan. Çalakî herî zêde li paytext Parîsê û derdora wê pêk hat. Bi dehhezaran xwendekaran lîse bloke kirin. Tenê li bajarê Seine-Saînt Denîsê 37 avahiyên lîseyê bloke bûn. Li bajarê Mantes-la-Joleî yê ser bi Yvelînesê nêzî 150 xwendekar ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin.

**Şerê bi polîsan re**

Li Marsîlyayê ku yek ji mezintirîn bajarê Fransayê ye, bi hezaran xwendekar ji ber fakulteya Saînt-Charlesê heta meydana Vîeûx-Portê meşiyan. Sendîkayên CGT, SUD-Solîdaîres û SNES'ê jî piştgirî dan çalakiyê. Bi destwerdana polîsan re di dema çalakiyê de şer derket. Li bajarê Nîceyê jî herî kêm 33 xwendekar hatin binçavkirin. Walîtiya Alpes-Marîtîmesê diyar kir ku şerê bi polîsan re bi taybetî li Lîseya Parc Împerîalê rû da.

**Xisarên madî pêk hatin**

Li bajarên Lyon, Lîlle û Montpellîerê ku ji mezintirîn bajarên Fransayê ne, di çalakiyan de gelek kes hatin binçavkirin. Li gorî Wezareta Karên Hundir, di çalakiyên gelemperiya welat ên lîseyiyan de zêdetirî 700 xwendekar hatine binçavkirin. Her wiha di dema çalakiyan de jî xisarên mezin pêk hatin.



**Pergala Parcoûrsûpê**

Xwendekarên Lîseyê li ber reforma hîndekariya bilind a bi navê 'Parcoûrsûp' û ezmûnên nû yên qedandina lîseyê radibin. Di pergala nû ya Parcoûrsûpê de mafê xwendekar heye ku ji 5 heta 10 beşên zanîngehê hilbijêrin. Bi vê pergalê re tercîha tenê beşeke biçûk a xwendekaran tê qebûlkirin. Bi giranî jî xwendekarên ji malbatên dewlemend an jî li lîseyê notên baş girtine, tên qebûlkirin. Bi vê yekê re her sal mafê bi sedhezaran xwendekaran ji wan tê standin ku nikaribin beşa dixwazin hilbijêrin. *PARÎS*

## Peymana YE'yê ya li ser penaberan bi cih nayê anîn

Welatên Yekitiya Ewropayê (YE) ji sala 2015'an û vir ve dike nake penaberan di nava xwe de nikarin parve bikin. Sala 2015'an piştî ku dîktator Erdogan deriyên sînor ên Tirkiyeyê vekir, zêdeyî milyonek penaberan berê xwe dabûn welatên Yekitiya Ewropayê û peyman hatibû çêkirin ku herî kêm 160 hezarê van penaberan di navbera 28 welatan de bên parvekirin.

Wezîrên Karê Hundir ên welatên Yekitiya Ewropyê ku li Brukselê li hev civiyan, di mijara parvekirina penaberan de li hev nekirin. Hate ragihandin ku Almanya û Fransa ji bo welatên ku naxwazin penaberan werbigirin welatê xwe, pêşniyar kirine ku ev yek bê qebûlkirin.

Li gorî nûçeya kovara Der Spiegelê, di navbera Wezîrê Karê Hundir ên Almanyayê Horst Seehofer û yê Fransayê Christophe Castaner de lihevkirineke bi vî awayî pêk hatiye. Di pêşniyara her du wezîran de tê gotin ku welatên ku pêşniyar kirine di vê peymana penaberan de cih negirin û çareseriyên alternatîf pêşniyar kirine dikare li derveyî vê peymanê bên hiştin.

Lê belê mijara ka wê ji van welatên ku pirsgirêk derxistine re di kîjan rewşê de rewşa îstîsna bê dîtin nehatiye zelalkirin. Li milê din tê ragihandin ku ji bo ev welat li derveyî Peymana Parvekirina Penaberan bimînin divê hejmareke têr a welatên Yekitiya Ewropayê tev li biryarê bibin.

Li gorî Der Spîegelê di Peymana Parvekirina Penaberan de yek ji astengiyên li pêşiya çareseriya parvekirina penaberan jî ew e ku serokwezîra Almanyayê Angela Merkel e ku wê bi xwe pêşniyara parvekirina penaberan kiribû.

Parvekirina penaberan di serî de Macaristan, endamên Yekitiya Ewropayê yên Ewropaya Navîn û Ewropaya Rojava li dijî vê peymanê derdikevin. *BRUKSEL*



## 'Divê Tirkiye ji Iraqê were derxistin'

Endamê Parlamentoya Iraqê ji Koma Hevpeymaniya Bînayan Mensûr Bêcî der barê mayîna hêzên artêşa tirk ên li Iraqê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Mensur Bêcî di daxuyaniya xwe de diyar kir ku hebûna hêzên tirk li ser axa Iraqê binpêkirina serweriya Iraqê ye û ev bi tu awayî nayê qebûlkirin. Di daxuyaniyê de daxwaz ji hikûmeta Iraqê hat kirin ku van hêzên biyanî ji nava xaka Iraqê derxîne û wiha got: "Pêwîst e ji vê zêdetir hikûmeta Iraqê li hemberî hebûna van hêzan li ser xaka Iraqê, bêdeng nemîne."

Bêcî diyar kir ku tu sedemek nîne hêzên tirk li nava xaka Iraqê bimînin û wiha direjî bi axaftina xwe da, "Tirkiye şerê bi hêzeke kurdî ya muxalîf re weke hincet dide nîşandan. Her wiha ev sê sal e jî Tirkiye bi hinceta şerê li dijî DAIŞ'ê di nav axa me de bi cih bûye."

Bêcî da zanîn ku Iraq bi hêza xwe, xwe ji DAIŞ'ê rizgar kiriye û got, "Divê hikûmeta Iraqê ji bo derxistina hêzên Tirkiyeyê yên ji Iraqê, bixebite. Eger bi darê zorê jî be divê hêzên Tirkiyeyê ji Iraqê werin, derxistin. Pêwîst e yek rojek din jî ev hêz di nava axa Iraqê de nemîne." Ji bilî baregehên leşkerî yên Tirkiyeyê ku li Herêma Kurdistanê çêkirine, di sala 2015'an de jî bi hinceta beşdarbûna şerê li dijî DAIŞ'ê, baregeheke leşkerî li Başîqayê ava kir. Herçend gelek caran hikûmeta Iraqê ji Tirkiyeyê xwest ku hêzên xwe ji wir derxe jî, lê heya niha jî Tirkiye guh nedaye Iraqê û van baregehan negirtiye. *BEXDA*



## Çarenûsa çeteyên DAIŞ'ê di destê welatan de ye

Wezîrê Parastinê yê Kanadayê Harjit Singh Sajjan piştî civîna endamên Koalîsyona Navdewletî ya li dijî çeteyên DAIŞ`ê li Sûriye û Iraqê, got ku çarenûsa 700 çeteyên DAIŞ`ê ku li Sûriyeyê hatine girtin, dê ji aliyê welatên wan ve were diyarkirin.

Televîzyona Sky Newsê diyar kir ku Wezîrê Parastinê yê Kanadayê Harjit Singh Sajjan piştî civîna berpirs û fermandarên 13 dewletên endamên Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ`ê duh li bajarê Tişîlsî hate lidarxistin, teqez kir ku çarenûsa 700 çeteyên DAIŞ`ê ku li Sûriyê hatine girtin, dê ji aliyê welatên wan ve were diyarkirin û divê her welatek li gorî mekanîzmaya xwe ya taybet tevbigire.


Her wiha Wezîrê Parastinê yê Amerîkayê James Mattis jî got ku 700 çeteyên DAIŞ`ê li gel hêzên HSD`ê girtî ne û welatiyên 40 welatên cuda ne.

Hinek welat ditirsin ku heger wan çeteyan bibin girtîgehên xwe, dê radîkalîzm lê belav bibe. Her wiha Washingtonê li ser gotins Mattis anî ziman ku hêzên HSD`ê nikarin wan çeteyan demeke direj li gel xwe bihêlin.

**Ji 46 welatan 795 çete**

Hevserokê Buroya Têkiliyên Giştî yên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Abdulkerîm Emer diyar kir ku şervanên HSD`ê 795 çeteyên biyanî, 584 hevjînên wan ku ew jî biyanî ne û hezar û 248 zarokên wan girtî ne. Emer destnîşan kir ku ew çete hemwelatiyên 46 dewletên cîhanê ne.

Her wiha Emer destnîşan kir ku dewlet ji berpirsyariya xwe ya li hemberî çeteyan direvin û teqez kir ku têkildarî mijara radestkirina wan awelatan, nîqaş tênê kirin. *WASHINGTON*



## Bi hezaran jinên myanmarî firotin

Li gorî raporeke li Bangokê weşiyayî bi hezaran jinên myanmarî li Çînê bi rêya zewicandina bi zorê hatin firotin. Tê gotin jinên Myanmarê ji mêj ve ye mexdûrên polîtîkaya yekzarokanînê ya Çînê ne. Li Çînê ji ber polîtîkaya zarokanîna bi kontrol 33 milyon mêr zêde ne.

Ji bo ku ev valahî were dagirtin, her sal ji Kamboçya, Laos, Myanmar, Vîetnamê jin diçine Çînê dizewicin an jî bi zorê têne şandin. Gelek jin ji hêla malbatên wan ve têne zewicandin an jî dikevin nav destê bazirganên mirovan.

Li gorî rapora dibistana tenduristiyê ya cameweriyê ya Amerîkayê Johns Hopkîngs ku li Bangkokê hatî weşandin, li eyalatên Kachîn û Shanê yên bakurê Myanmarê nêzî 7.500 jin bi zorê firotine çîniyan. Lêkolîn xwe dispêre ser şahidiya jinan. Tê gotin zor li jinan tê kirin da ku zarokan bînin. Di raporê de tê diyarkirin bi giştî pêşiyên gundiyan an jî malbat di nav xwe de li hev dikin. Li gorî raporê mêrekî çînî bi 10-15 hezar doleran dikare jinekê bikire. *BRUKSEL*



## Pêşnûmaya DYA'yê ya li ser Hamasê nehat qebûlkirin

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ji bo mehkûmkirina Hamasê ku Gazzeyê kontrol dike, pêşnûmayek pêşkêşî Neteweyên Yekbûyî (NY) kir lê pêşnûma nehate qebûlkirin. Di pêşnûmaya DYA'yê de hate îdîakirin ku Hamas rêxistineke tundrew e û metirsî ye li ser jiyana sivîlan.

Li Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî, bi dengdanê daxwaza DYA'yê hate redkirin. Beriya dengdanê, Kûweytê pêşniyar kir ku ji bo qebûlkirina pêşnûmaya DYA'yê, divê şertê dengê du ji sê paran hebe. Û ev pêşniyara Kûweytê qebûl bû.

Hamasê piştî dengdanê daxuyaniyek da û îdia kir ku Neteweyên Yekbûyî sîle avêtiye DYA'yê. El Fetîhê jî bi daxuyaniyekê destek da Hamasê. *NEW YORK*

www.arsivakurd.org



## Ganî fatureya krîzî kedkaran rê nêra birnayîş

**ÊLIH -** Perê pêvînayîşê seba meaşê kêmî dest pêekrdî. Do temsîlkarê karkeran û hukmat binê Komîsyonê Tespîtkerdişê Meaşê Kêmtirîn de meaşê 2019î dîyar bikerî. Konfederasyonê Sendîkaya Kedkaranê Rayapêroyî (KESK) dîyar kerde ke na babete tena kedkaran eleqedar nêkena û rewşa heme komelî dîyar kena. Hemserekê Pêroyî yê KESKî Mehmet Bozgeyîkî da zanayene ke ganî fatureya krîzî kedkaran rê yena birnayîş, labelê ê do detûr nêdî na rewşe.



# Cizîr xoverdayîş û ruhê Newroze yo

Cizîro ke xoverdayîşê Newroza 1992î ke vîrê heme merdiman de ca girewt, bi qedexeyê 14ê kanûna 2015î ke 79 rojan dewam kerdbî reyna dejê merdiman newe kerd. Vatişê Hemserekê Meclîsê Şarî Mehmet Tunçî hema zî vîrê heme kesan de yî. Xoverdayîş ra nata 3 serrî derbaz bî

Qezaya Cizîrî ya Şirnexî de 14ê kanûna 2015î de qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan ame îlan kerdiş û qedexe ra 3 serrî derbaz bî. Qedexe heta 1ê adara 2016î dewam kerd û 79 rojan domna. Prosesê pêrodayîşan de 66 endamê Yewîya Pawitişê Sîvîlan (YPS) cuya xo vindî kerdî û 123 sivîlî ameyî qetilkerdiş. Pêroyê qeza bi tank, top û bombebeyan ame piştiş û 150 kesî bombardumanê taxê Cudî û Nurî de ameyî qetilkerdiş. Pêrodayîşê taxê Nur, Sûr, Cudî û Yasef de 161 leşker û polîsî merdî û 117ê înan zî birîndar bîbî.

Cêrzemînê raşteyê 23. yê Bostanci ya taxa Cudî de Hemserekê Meclîsê Şarî yê Cizîrî Mehmet Tunçî cuya xo vindî kerd û vatişê ci yê ‘Ma teslîm nêbenî, ma do bi beyraqanê sipî nêvejîyî teber. Ganî kesê ke mendî bi ma sere berz bî. Ma do sere nêronî. Ma nika paweyê mergî yî. Ez veng dana şarê kurd. No têkoşîn o. Rayîrşîyayîşêk derg o. Ganî kesê ke mendî moralê xo berz bikerî. Wa şikê kesêk çin bo. Ez embazanê ke têkoşîn danî silam kena. Şarê Cizîrî do vera faşîzmê AKPyî de sere nêrono’ hema zî vîrê heme kesan de yî.



**Tena rapor amade kerdî**

Qedexeyan ra 6 menge dima Komîserê Berzî yê Heqê Merdiman yê NYyî Prînce Zeîd Raad Zeîd al-Husseîn va: “Destê ma de raporê şahid û merdiman ke 100 kesî bi hawayo ganî hetê hêzê dewleta tirkî ra ameyî veşênayîş esto.” Labelê heta nika derheqê mergan de ti tehqîqatêk nêameyo dest pêekrdiş. Prosesê qedexeyan de muracato ke huqûnasî Mehkemeya Heqanê Merdiman ya Ewropa (MHME) kerdî zî nêame qebulkerdiş û muhakemeya mîyanneteweyî û rayapêroyî tena rapor amade kerdî.

**Heme muracatî ameyî redkerdiş**

Muracatê avûkatê ke girêdayeyê Platformê Huqûqnasanê Azadîwaştoxan (OHP) yê Cizîrî zî bê netîce mend. Avûkatê OHPyî îtîrazê qerarî kerdî û bale antî cigêrayîşê cayê hedîse û vatî: “Cêrzemînê 3 awanîyan de 23ê ci doman pêropîra 177 cenaze ameyî vetiş û kamîya 103 kesan ameyo tespîtkerdiş. Kamîya 74 kesan zî dîyar nîya û ameyî definkerdiş. Bi desan cenaze ameyî veşênayîş û parçekerdiş.” Prof. Dr. Şebnem Korur Fincanciye zî wina vatbî ‘Dozger nêşîyo cayê hedîse, cigêrayîş baş nêameyo kerdiş û wezîfeyê xo binpay kerdî’ reaksîyon nîşan dabî.

**Cizîr bajarê xoverdayîşî yo**

Cizîr Newroza 1992î de vîrê heme merdiman de cayê xo girewt û sey bajarê xoverdayîşî yeno zanayîş. Serra 2015î de zî bi serra xoverdayîşêk pîl. Badê qedexeyê 79 rojan herinda awanîyan de bi talîmatê AKPyî xebata TOKÎ dîya dest pêkerdiş. Cinîyê taxê Cudî û Nurî dîyar kerdî ke polîsî zextê psîkolojîk bi hemwelatîyan kenî û sewbîna raştê tacîzo fîzîkî yê polîsan yenî. *ŞIRNEX*

# NÇM 27 serran xo dima verda

Emserr serrgêra 27. ya Merkezê Kultur û Mezopotamya (NÇM) ya. Bi wesîleya serrgêra 27. ya awanbîyayîşê NÇMyî Veysel Altay, Cîhat Ekîncî û Omer Şahînî derheqê tarîx û karê ke heta nika ameyî kerdiş de qisey kerdî.

Tîyatrokarê Teatra Cuya Newe Cîhat Ekîncî heme çî ra ver bale ant muhîmîya kulturî seba neteweyan û prosesê netewbîyayîşî ser. Ekîncî qiseykerdişê xo de dîyar kerd ke NÇM seba kurdan rêxistinbîyayîşê destpêk yê komelbîyayîşî yo û va: “Merkez sere de Stenbol de ame akerdiş û heme karê hunerî yê Kurdistanî kerdêne. Kesê ke hunerî reyde eleqedar byêne ameyêne NÇMyî. Senî ke xeber bi rayîrê çapemenî yena vilakerdiş, kultur zî wina ya. Cok ra dewlete hêrişê ma kena.”



Mezopotamya Sînema Yapim 13. NÇM ra Veysî Altayî zî ard vîr ke prosesê qedexeyê ziwan, kultur û heme rengan de NÇM ame awankerdiş û va: “Hedefê NÇMyî pawitişê kultur, ziwan û heme rengan o. 27 serrê xelê zehmetin û giran derbaz bî.”

Tewr peynî Omer Şahînî qisey kerd û va: “NÇM destpêk de karê muzîk, serra 1992î de karê tîyatro û serra 2000î de zî prosesêko newe kerd. Ma veng dan heme kesan ke 9ê kanûne de Merkezê Xopêşandanî yê Bostanci de tewrê pîrozkerdişê serrgêra NÇMyî bibî.”

Gulîstan Eylem Ustune xebatkara NÇMyî bî û qezaya Cizîrî ya Şirnexî de prosesê qedexeyê tebervejîyayîşî yê 14ê kanûna 2015î ke 79 rojan dewam kerdbî de cêrzemînê keyeyêk de ameybî veşênayîş. Ferîde Yildize zî mamostaya govende bî û aye zî qezaya Cizîrî ya Şirnexî de cêrzemînêk de ameye veşênayîş. *STENBOL*

## Hirê nesilî Raşteyê Galatasarayî de yî



Kasim Alpsoy kesê ke binê çiman de ameyî vindîkerdiş ra yew o. Domanê ci Raşteyê Galatasarayî de ronîşenî û aqûbetê pîyê xo persenî. Nika zî torinê Alpsoyî estî û ê zî edalet gêrenî.

Kasim 30 serrîya xo de 18ê Gulana 1994î de Anqara de netîceyê eştişê serê keyeyan de ame tepiştiş. Aye roje ra nata ti xebere ci ra nêameya girewtiş.

Aye wext lajê ci Mehmet Alpsoy hîna 12 serrîbî û tewrê waya xo Gulbahar û dayîka xo tewrê çalakîya Dayîkê Şemeyan bîyêne. Nika zî domanê Mehmet û Gulbaharî aqûbetê kalikê xo persenî.

Torinê Kasim Alpsoyî Gulbahare dîyar kerde ke ê têkoşînê xo bi mandar vînenî û do heta peynî fek têkoşînê x ora vera nêdî. *STENBOL*



## Destûr nêdanê cenazeyan defin bikerê

Latîfe Akyuza ke qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan ê Nisêbînî de tornê xo Mehmet Şirîn Akyuz û birazayê xo Îbrahîm Akyuzî vindî kerde, dîyar kerde ke nimûneyê DNAyî ro ci ameyê, la seba ke destûr nêdanê, cenazeyî goristanê bêkesan ê Riha de yê.

Akyuze daye zanayene ke her wirdî cenazeyî goristanê bêkesan ê Riha de yê û wina va: “Her wirdî zî heta qedexeyê peyîn zere de mendî. Îbrahîm taxa Zeynel Abîdîn û Mehmet zî taxa Abdulkadîrpaşa de cuya xo vindî kerd. Dimayê pêrodayîşan bi aşman ma cenazeyan geyrayî. Ma 6 aşmî verê cenazeyê Mehmet, di aşmî verê zî ê Îbrahîmî dî. Her wirdî zî goristanê bêkesan ê Riha de yê.”

Akyuze dîyar kerde ke înan waştê cenazeyan Goristanê Haceca yê Nisêbîn de defin bikerê, la bi sebebê qedexe destûr nêameyo dayîş. Latîfeye wina va: “Tîya merdim heta cenazeyê xo defin kenê, xeylê çîyan cuyenê. Çira destûr nêdanê? Ma wazenê serê herra xo de defin bikerê. Hêrişê goran kenê. Texrîb kenê. Ma no edalet o? Tu şerêke de wehşetêke wina nêameyo vînayîş.” *MÊRDÎN*

# Cenazeyan tewrê hafrîyatî eştî Çemê Dîcle

Qezaya Sûrî ya Amedî de hema 6 taxî qedexekerde yî. Qedexeyê Sûrîya 3 serrî derbaz bî, labelê çîyê ke ewja de qewimîyayî hema zî sey roja ewil vîrê heme kesan de yî. Kênaya Fahrîye Çukure, Rozerîn Çukure (17) 8ê çeleyê 2016î de nizdîyê Mektebê Seretayî yê Suleyman Nazîfî de ameye qetilkerdene. Fahrîye Çukure derheqê serrgêra qedexeyan û kênaya xo de qisey kerde.

Çukure qiseykerdişê xo de wina va: “Cenazeyê merdiman tewrê hafrîyatî eştî Çemê Dîcle. Ma mumkuno ke merdim înan vîrî bikero. Rozerîn gula keyeyê ma bîye û domanîya x ora nata meylê aye xêrkerdişê resmî rê estbî. Timî mamosteyanê xo reyde kewtêne munaqeşeyan. Matematîkê aye zaf baş bîye. Sûr de xeylê ciwanî ameyî qetilkerdiş. Sûr bêro newekerdiş zî çimê mi de sey eşteyêk o. Ez ewja de viraştişê vîlla û awanîyan qebul nêkena. 3 rojî verê cû ez saet 12ê şewe de şîya Mînareyo Çarling. Tena ez û kutêkek ewje de bîyî. 3 serrî derbaz bî, labelê dejê mi sey roja ewilin a. ez bi dermanan pay de vindena.”

**OHAL dewam keno**

Pîyê Rozerîn Çukure, Mustafa Çukurî zî bale ant weçînayîşê herêmî ser û va: “Qayûmê Amedî se bikero zî nêeşkeno qezenc bikero. Her gamêk de qereqol esto. Ma no azadî yo? Her çiqas ke rewşa OHALî peynî bikerî zî Sûr de OHAL dewam keno.” *AMED*



## Qayûm tena rayîrê qereqolan akeno

Hukmatê AKPyî wexto ke Şaredarîya DBPyî ya Colemêrgî xesp kerde sey heme cayan bînan tîya de zî şarê rê xizmet ame birnayene. Colemêrg de bi varayîşê vewre zura ‘Ma şarî rê xizmet ard’ yê AKPyî reyna vejîyayî meydan. Colemêrg de rîyê varayîşê vewre ra heme rayîrê qefilyayî. Bi seyan wesayîtî rayîr de mendî û domanî nêeşkayî şirê dibistanî. Şaredarîya AKPyî ke îradeyê şarî xesp kerde herinda şarî rê xizmetkerdişî de tena rayîrê qereqolan akerdî.

Hemwelatijanê Colemêrgî qayûmî rê hêrsê xo ard ziwan û dîyar kerdî ke Şaredarîya DBPyî rixmê heme herîşanê dewlete şarî rê xizmet kerdêne, la qayûm tena zirar dano şarî. *COLEMÊRG*

www.arsivakurd.org

# Şikandina tecrîdê şikandina faşîzmê ye

**Parêzera Ocalan û parlamentera HDP'ê Ebru Gunay têkildarî çalakiyên greva birçîbûnê axivî û wiha got: *"Heke berxwedanek dest pê kiribe jê veger tune ye."***



**Zeynel BULUT / MÊRDÎN**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji 27'ê tîrmeha 2011'an ve ye bi parêzerên xwe, ji 5'ê nîsana 2015'an ve bi Heyeta Îmraliyê re û ji 11'ê îlona 2016'an ve ye jî bi malbata xwe re nikare tu hevdîtinê bike. Ocalan ji 5'ê nîsana 2015'an ve ye di bin tecrîdeke girankirî de ye. Ji bo rakirina tecrîdê bi taybetî parêzerên Ocalan û siyaseta kurd serî li gelek saziyên eleqedar dan lê tu encam nehat bidestxistin. Herî dawî jî hevseroka KCD'ê û parlamentera Colemêrgê Leyla Guven a ku ji meha çileya 2018'an ve di Girtîgeha Tîpa E ya Amedê de girtiye ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir. Piştgiriya ji bo çalakiya Guven û rakirina tecrîdê her ku diçe belav dibe. Li gelek bajaran parlamenterên HDP'ê jî di nav de çalakî tên li darxistin û li hemû girtîgehên li Tirkiye û Kurdistanê jî girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê jî ji 27'ê mijdarê ve ye bi awayekî bêdem û dorveger di çalakiya greva birçîbûnê de ne. Li avahiya HDP'a Mêrdînê jî parlamenterên bajêr Tuma Çelîk û Ebru Gunay ji bo 3 rojan ketin greva birçîbûnê. Yek ji parêzera Ocalan û parlamentera HDP'ê ya Mêrdînê Ebru Gunay der barê tecrîda li ser Ocalan û çalakiyên girevên birçîbûnê ji rojnameya me re axivî.

▶***Hevseroka KCD'ê û Parlamentera HDP'ê Leyla Guven li dijî tecrîda li ser Ocalan mehek e di greva birçîbûnê de ye û pêl bi pêl belav bû û hûn jî tev li vê berxwedanê bûn. Hûn vê berxwedanê çawa dinirxînin?***

Em ji roja despêkê ve dibêjin çalakiya hevala Leyla çalakiya me ye, daxwazên wê jî daxwazên me ye. Lewre Leyla Guven dibîne ku tecrîda li Îmraliyê ne tenê li ser birêz Ocalan e. Ev tecrîd li ser tevahî Kurdistanê ye û ev tecrîd li ser daxwaza gelê kurd e. Ji ber vê jî Leyla Guven vê yekê qebûl nake. Em jî ji bo xurtkirina vê çalakiyê tev li vê berxwedanê bûn.

▶***Ev berxwedan çalakiyeke bêîteatiya sivîl e û pêl bi pêl mezin dibe. Lê li aliyê din jî li dijî vê êrîşên dewletê hene li ser vê mijarê hûn dikarin çi bêjin?***

Niha dewlet baş dizane em mafdar in. Ji ber wê jî naxwaze ev mafdariya me li nav gel belav bibe. Niha AKP bi zext, zor, şer û tecrîdê xwe li ser pêyan dihêle. Ji ber daxwazên Leyla Guven ên herî mirovî û rewa ne ev destihilatdariyê tengav dike. Ji ber wê jî êrîş dike. Heta niha meclisa Tirkiyeyê li ser vê çalakiyê tiştek negotiye. Lê Guven endameke meclisê ye. Dewlet û desthilatdarî vê berxwedanê nabîne û bêhiqûqiya xwe qebûl nake. Lê belê em jî bi çalakiya xwe vê yekê nîşanî wan didin.

▶***Dewlet û desthilatdarî bi awayekî hewl didin ku çalakiyên li derve tên li darxistin bitepisîne lê belê nikare çalakî û berxwedana li zindanan rawestîne. Niha li hemû girtîgehan ev berxwedan heye. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?***

Niha ji bo hevala Leyla di warê tenduristiyê de asteke xeter dest pê kir. Zindan qadeke bi biryar e. Heta daxwazên wan bi cih neyên ranawestin. Hevalên zindanan ji bo birêz Ocalan gelekî hestiyar û girêdayî ne. Çalakiya hevala Leyla jî çalakiya xwe dibînin, xwedî li vê berxwedanê derdikevin û mezin dikin. Em naxwazin mirinek çêbibe û divê ev daxwaz bi cih werin.

▶***Dê dewlet û hikûmet çawa nêzîkê vê berxwedanê bibe û dê şûnde gav biavêje?***

Gavavêtina hikûmetê bi xwedîderketina li vê berxwedanê û bilindkirina wê ve girêdayî ye. Em çiqasî dikaribin vê çalakiyê li her qadê belav bikin û xwedîderketineke mezin pêş bixin dê hikûmet neçar bimîne ku şûnde gav biavêje. Hikûmetek nikare daxwazên gel ji nedîtî ve bê.

▶***Dê heta kengî hikûmet li dijî vê çalakê bêdeng bimîne?***

Dîrokeke berxwedanê a vî gelî heye. Me berxwedana herî bi êş ceribandiye. Heke berxwedanek dest pê kiribe jê veger tune ye. Her kes vê yekê baş dizane. Em di çalakiya Leyla Guven de jî vê biryardariyê dibînin. Guven nîşan da ku hexlaqê wê yê siyasî û polîtîk vê rewşê qebûl nake. Em bi çalakiyên xwe dibêjin ev rewş nayê qebûlkirin. Em jî destûrê nadin ku ev tecrîd bidome û hevalên me li pêşberî çavên me roj bi roj bihelin.

▶***Çalakiya greva birçîbûna ya 2012'an a li zindanan dereng bûbû rojev û hat asteke xeternak. Lê belê vê carê di dema xwe de raya giştî ava bû. Hûn vê rewşê çawa dinirxînin?***

Di dema çalakiya 2012'an a ku 68 rojan berdewam kir de ez jî di zindanê de bûm. Rast e piştî ku hatibû asteke xeternak hêj nû ketibû rojevê. Lê vê carê rojevbûyîn zû pêş ket. Li aliyê din em hevala xwe Leyla Guven baş nas dikin heke biryarek dabe dê teqez bi serfkeftî encam bike. Em dizanin ku heta daxwazên wê bi cih neyên ew dev ji çalakiya xwe bernade. Em jî li gorî wê xwedî li vê çalakiyê derdikevin. Gelê kurd jî xwedî ew mîrateya berxwedanê ya dîrokî ye. Lê belê ji niha û şûnde pêwîst e çalakî bên xurtkirin lewre êdî em gihîştine qonexeke xeternak.

▶***Çima çalakiyên bi vî rengî ji zindanan dest pê dikin. Her çiqas Leyla Guven siyasetmedarek be jî lê di encamê de zindanî ye. Gelo di vê qonaxê de gel û siyaset rista xwe nalîze ku zindan dikeve dewrê?***

Ji zindanê temaşeya li der ve gelekî zelal e. Her tiştî baş analîz dikin, rê û bêbazên çarezeriyê pêş dixin. Heke li zindanê pêvajoyeke çalakiyan dest pê kiribe, ev peyamê didin der; 'hûn vî karî baş nakin, bertek û têkoşîna we têr nake ji ber vê yekê jî em dikevin dewreyê' îro tişta ku hevala me Leyla ji bo me dibêje jî ev e. Di heman demê de em wekî rexneyekê jî li xwe digirin. Hevala me Leyla ji bo xwe tiştekî naxwaze. Ji bo rakirina tecrîda li ser birêz Ocalan di grevê de ye. Ev jî pirsgirêka me hemûyan e. Pirsgirêka hemû Kurdistanê û li gorî min pirsgirêka Rojhilata Navîn e. Ji lewre ew gotina "Ocalan temînata aştiyê ye" ne ji rêzê ye. Çalakiya hevala me Leyla jî vê yekê ji nû ve tîne bîra me.

▶***Birêz Ocalan gelek caran aniye ziman ku 'Ji bo azadiya min tiştekî nekin, ji bo azadiya xwe bikin' hûn vê gotinê û çalakiyên tên li darxistin bi çi ve girê didin?***

Niha azadiya civaka kurd û ya birêz Ocalan bi hev ve girêdayî ye. Nepêkan e ku mirov ji hev cuda bigire dest. Di pêvajoya diyalogê de heyetên ku diçûn Îmraliyê ji birêz Ocalan dipirsin; 'Ji şert û mercên xwe çi bendewariyên we ji me hene', birêz Ocalan jî dibêje; 'Ji bo çareseriyekê pêwîst e şertên min ên tenduristiyê, ewlehî û tevgerîneke azad bi cih bên'. Dema mirov lê dinihêre, dibêje qey birêz Ocalan van tiştan ji bo xwe xwestiye. Lê belê dema em lê dinihêrin ev daxwaz ji bo hemû gelan tiştekî jê neveger û pêwîst e. Ev şert û merc ji bo her kesî pêwîstiyeke jiyanî ye. Ji bo aştiyeke civakî ya mayînde jî pêwîstî bi van şert û mercan heye. Ji ber wê jî rewşa civak û birêz Ocalan mirov nikare ji hev cuda bigire dest.

▶***Hûn dikarin di vî warî de mînakan bidin?***

Em dikarin bi mînakan jî şênber bikin; di hezîrana 2015'an de di şevekê de çete ketin Kobanê û zêdetirî 250 welatî li malên wan qetilkirin. Di heman demê de di şevekê de hêzên dewletê bi ser malên siyasetmedarên kurd de girt û bi dehan kes binçav kirin. Ji ber vê jî em tên ser gotinên birêz Ocalan ên wekî; 'Tenduristî, ewlehî û azadiyê'. Ji ber vê jî ev çalakî tenê ne ji bo birêz Ocalan ji bo her kesî û ji bo civakê ye. Em bi vê çalakiyê ji faşîzma AKP'ê re dibêjin bes e. Lewre ev faşîzm yek bi yek bandorê li ser jiyana me dike. Em jî dibêjin êdî em vê yekê qebûl nakin. Ez ji cerebeyên xwe yên li Îmraliyê dizanim. Her ku şer kûr dibe tecrîd kûr dibe û her ku tecrîd kûr dibe şer jî kûr dibe. Ew tecrîda li Girava Îmraliyê li bejehaya Kurdistanê tê wateya şer, mirin û hilweşandinan. Ne tiştekî din e. Ji lewre derketina li dijî tecrîdê tê wateya dijderketina şer, mirin û komkujiyan. Divê em vê ya baş fêhm bikin û bidin fêhmkirin. Ji ber vê yekê jî pêwîst e ev çalakî li her deverê belav bibe ku bigihêje armanca xwe.

▶***Pergala Îmraliyê wekî labaratuwarekê û derbaskirina civakê tê nirxandin wekî parêzera Ocalan ji çavdêriyên xwe hûn dikarin çi bêjin?***

Desthilatdariya AKP'ê pergala Îmraliyê wekî labratuwarekê bi kar tîne. Tiştên ku li Îmraliyê diceribînin dema ku dibîne encamê digire li ser civakê pêk tîne. Pergaleke ku bi teknîkê xwe li ser pêyan dihêle ye. Yek qenala têkiliyan e, odeya yek kesî ye, yek qenala radyoyê ye û hwd. lê belê îro em vê yekê wekî rejîmeke yek zilamî dibînin. Lewre zîhniyet heman e. Ev veguheriye şêwazeke rêvebirina civakê. Ez mînakeke şênber bidim; li Cizîrê bi mehan derketina kolanan hat îlankirin. Ev rêbazeke tecrîdê ye. Bi heman rêbazî li Sûrê bi mehan qedexeya derketina kolanan hat îlankirin. Ev rêbaza tecrîda bajarekî ye. Lê belê me vê yekê fêhm nekir. Me tenê tecrîd bi birêz Ocalan ve girê dida. Lê belê ev pergaleke û lazim bû me li dijî vê pergalê têkoşînek pêş xistibûna.

▶***Hûn wek HDP û siyaseta kurd bi gelê kurd û gelan didin fêmkirin?***

Ji polîtîkayên hêzên hegemon ên li ser civaka kurd û yên Rojhilata Navîn bigire heta bi komployê radestkirina birêz Ocalan a Tirkiyeyê, tecrîda heyî û sedemên ku ji ber vê tecrîdê rû didin mixabin me bi civakê nedaye fêhmkirin. Niha jî ev çalakiyên ku tên li darxistin mirov dikare wekî telafîkirina vê pêvajoyê binirxîne.

▶***Şikandina vê tecrîdê û azadiya birêz Ocalan dê bandorek çawa li ser civak, siyaset û demokrasî bike?***

Niha bi şikandina tecrîdê re ew rêya ku diçe azadiya birêz Ocalan jî vedibe. Ew pêvajoya ku ji bo azadiya birêz Ocalan jî bê destpêkirin dê bibe pêvajoya şikandina tecrîdê. Ji lewre jî dê ew paradîgma û felesefeya azadiya ji bo civak û gelan jî roj bi roj pêş bikeve. Ji bo vê jî bi awayekî cidî pêwistî bi vîneke çareseriyê heye. Birêz Ocalan jî her tim balê dikişîne ser vê vîn, hêz û biryara israra di çareseriyê de. Bêguman ên ku vê yekê nexwazin jî dê hebin. Em vêya ji cerebeyên cîhanê dizanin. Şikandina tecrîdê tê wateya gav bi gav şikandina faşîzmê. Yanî bi kurtasî şikandina tecrîdê û azadiya birêz Ocalan ji bo rojên xweş û geş dê bibe destpêkek. Gelê kurd jî xwedî ew mîrateya berxwedanê ya dîrokî ye. Lê belê ji niha û şûnde pêwîst e çalakî bên xurtkirin lewre êdî em gihîştine xonexeke xeternak.

